

مركز



مركزين صديقة
البيئة
مكونات الغلاف
الحيوي للبيئة

العدد ١٢٧ - ٢٠٢٢/١٠/١



حقيبة مركزين

قلعة أمد

الأدب العربي

المحبة

طبية العائلة

قواعد المحبة

إعداد: عامر فرسو * رسومات: خالد بيجو و عبد الرحمن خليل * تصميم: رامي مسور و بيريفان العمر * ترجمة: سريست عته
تحرير: سوزان علي
مركزين مجلة للأطفال تصدر عن مؤسسة روناهاي



Bajarê Amedê

Aras wêneyê sor yê keleha Amedê di destê wî de ye, nîşanî hevalên xwe dike.

Cûliya: Bajarê Amedê li kû ye?

Mizgîn: Li bakurê Kurdiştanê, nêzîkî çemê Dîclê ye

Ra`id: Piraniya xelkê wê Kurd in, lê Ermen û Ereb jî lê hene. Erdê wê bibereket e û ava wê jî pir e. Herwisa bi çandiniya genim, kuncî û şebeşên mezin navdar e.

Mizgîn: Wey destxweş Ra`id, li ser van agahiyan. Nadiya, gelo derbarê Amedê de tu çi dizanî?

Nadiya: Amed bi mizgeft û kenîseyên xwe yên kevnar û mûzeyên xwe navdar e. Aras kêfxweş dibe. Li çepikan dide û dibêje, Amed bajarekî pir kevnar e. Bi destê Hûriyan hatiye avakirin û xwediye şariştaniyeke zengîn e.

Corc pir kêfxweş dibe û spasiya hevalên xwe dike

آمد

يحمل آراس صورة لسور مدينة آمد، وقلعتها الشهيرة فيعرضها على أصدقائه بفرح.

تسأل جوليا باهتمام، أين تقع مدينة آمد؟

مزكين: تقع على ضفاف نهر دجلة في باكور كردستان.

رائد: وأنا أعرف عنها الكثير، فسكانها معظمهم من الكرد، وكذلك بعض العرب، والأرمن يسكنون فيها، وتشتهر آمد بزراعة القمح، والسمسم، والبطيخ الكبير الحجم، فأرضها خصبة ومياهها وفيرة.

مزكين تشكر رائداً، وتسال ناديا، وأنت صديقتي، فماذا تعرفين عن آمد؟

ناديا تنهض، وتعدُّ على أصابعها بفرح: توجد في المدينة الكثير من المساجد والكنائس والمتاحف، ومن أشهرها: متحف العصور التاريخية.

فيضيف آراس: نعم صديقتي، فأول حضارة في آمد هي: حضارة الهوريين منذ أكثر من خمسة آلاف عام.

يصفق جورج بفرح: أصدقائي شكراً لكم.

Pîrozbayiya Sersalê

Pîrozbayiya sersala mîladî çavkaniya wê xwe digihîne bûyera xwedawenda ronahiyê û parêzvana raştiyê MÎTHRA ku li gorî baweriya Mîtraîzmê 21ê Kanûnê MÎTHRA dimire û 25ê Kanûnê careke din sax dibe. Mîthra xwedawenda gelên Aryen (Arî) bû. Jixwe ola Zaredeştî jî koka xwe ji vê baweriyê digire û di pirtûka pîroz Avesta de behsa Mîthra hatiye kirin. Xwedawenda Mîthra ku bi teşeyê rojsêlekê di erebeyeke hespên spî de dikişînin, dihat nîşandan. Pêxistina agir jî ji rêûresmên pîrozbayiya sersala Mîthra ye. Lewra agir hêmana şkandina tariyê (şev) ye. Jixwe ronahiya (meşele) xwedawenda ronahiyê Mîthra ya nayê vemirandin, roj bixwe ye.



رأس السنة الميلادية

رأس السنة الميلادية تعود في جذورها إلى آلهة النور وحامية الحقيقة ميثرا والتي حسب المعتقدات الميثرائية تتوفى في (٢١ كانون الأول) وتعود للحياة من جديد في (٢٥ كانون الأول).

ميثرا هي آلهة الأقوام الآرية والديانة الزرادشتية تأخذ معتقداتها من جذور الميثرائية وورد ذلك في الكتاب المقدس آفستا.

وكان ميثرا يُصوّر على هيئة قرص شمس في عربة سماوية تجرّها خيول بيضاء. ومن طقوس احتفالات رأس السنة الميلادية إشعال النيران، حيث أنّ النار ترمز إلى دحر الظلام المتمثل في الليل، والإبقاء على شعلة الإله النورانية المتمثلة في الشمس (ميثرا).



Mizgîn
Dosta Xwezayê ye
صديقة البيئة

مزكين تعرّف أصدقاءها الأطفال على مكوّنات الغلاف الحيويّ للبيئة

فتدعوهم للمحافظة عليها، وحمايتها من التلوّث، وتدعوهم
للتعاون في حملة نظافة مجرى نهر المدينة

**Mizgîn wê pêkhatayên
jîngehê bi hevalên xwe
bide nasîn, da jîngehê
nas bikin û biparêzin.**

هذه الاكياس تلوّث الغلاف المائيّ، يا أصدقاء،
وتضرّ الحيوانات

Ev kîs atmosfera avê qirêj
dikin û zirarê didin lawiran.



لا يا صديقي لا تشعل النيران في الأوساخ،
سننقلها الى الحاوية، فدخانها يضرّ بالغلاف
الجويّ، وبالبيئة كلّها

Na, em agir bernadin
gemarê, lewra dûyê wî
atmosfera hewayê qirêj dike.

وبقايا هذه الموادّ تلوّث الغلاف الصخريّ،
وتضرّ التراب، والنبات

Bermayiyê van madeyan
atmosfera axê qirêj dike û
zirarê dide şînatiyê.



Mizgîn
Biîşka Malbatê
طبيبة العائلة

مزگین تتحدث لأصدقائها عن بعض قواعد حفظ الصحة:

Mizgîn hevalên xwe fêrî pêdiviyên tenduristiyê dike



أغسلُ يديَّ قبلَ الأكلِ وبعده.

Berî xwarinê û piştî wê emê destê xwe bişûn


أنظفُ أسناني بعدَ الأكلِ.

Piştî xwarinê emê didanên xwe firçe bikin



أغسلُ الخضارَ، والفواكهَ، جيداً قبلَ تناولِها.

Berî xwarina sebze û meyweyan, divê em wan baş bişûn



لا أشتري الحلوى إلا وهي مغفّفة.

Eger baş ne pêçayî û dûrî destan bin, emê şîraniyê nekirin



لا أتناولُ الأغذية الملوثة أبداً.

Xwarina gemar ti carî nexwin



أضعُ الكمامةَ الطبيّةَ في الأماكنِ العامّةِ.

Emê berdevka ji bo parştina ji nexweşiyên ii
bîr nekin





مزكین تڌڠر اُمدقاڌاها بعض اُدوات المائڌة، بلفاتهم الجميلة

Mizgîn wê hin alavên xwarinê ji
hevalên xwe re bide nasîn



الإبريق
Çaydan
مه صعا
jug



الكأس
Piyale
صعا
Cup



الصَّحْنُ
Lalî/sênî
حصا
Plate



السكين
Kêr
حصا
Knife



الشَّوْكَة
Çetel
حصا
Fork



المِلاعَّة
Kevçik
لوهوا
Spoon



Rengkirina gulê


Alavên pêwîst:

- Gulên spî (2 heb)
- Piyaleyên lek (plastîk) (2 heb)
- Hibra sor
- Av

Qonaxên ceribandinê:

- 1 Emê her du piyaleyan tijî av bikin
- 2 Emê di piyaleyekê de hibra sor tevî avê bikin
- 3 Pişt re emê her gulekê di piyaleyekê de bi cî bikin
- 4 Emê çend saetan li hêviyê bimînin

10



Encama ceribandinê

Gula di piyaleya ava sade de weke xwe maye. Lê ya avê û hibra sor, rengê gulê sor bûye.

Çima?

Hibra sor û av tevlihev bûne. Dema gul avê dimije di rayên wê de hibir derbas dibe heta digihe pelên wê. Gul jî rengê xwe yê sor dide pelan û gul sor dibe.



المحبَّة

وكأنَّها دَفقُ
الأغاني في المدى
تأتي كما الرِّيحانُ
في الأرواح
تغفو كالحكاياتِ
التي لا تنتهي..
تتمو كنهر النورِ
في أعماقنا
وتُثيرُ فيها عَتمةَ
الحُزنِ الدَّفينِ



الشاعر: عبد المجيد قاسم



KÎSIKÊ QIDAM

Dam û dam kîsikê qidam. Qirdikê qudoş sîtil û
beroş. Mehmê Reşoş tûrê kayê ji ba Xwedê hilweş
erdê. Erd bû giya xêr rijiya tûr qetiya. Serê salê binê
salê Xwedê zarokekî bide kevaniya malê. Kevaniyê
destzêrînê. Dest bavê binê kulînê. Para qirdik zû
bînê. Heçî bide Xwedê bide. Heçî nede mar pê ve de

Ji Pirtûka «Minminîkên Rengîn» Salihê Heydo





مزگین مع آمدقائها آراس -
نادیا - رائد - جولیا - جورج

Mizgîn û hevalên wê Aras- Nadya-Raid-Cûlya-Corc





نرين صبري



نرين صبري ذات الصوت الجميل؛ تمتلك موهبة الغناء؛ منذ كان عمرها ثماني سنوات وهي تغني لأهلها، ولصديقاتها، فشجعته والدتها على الغناء، وكذلك على الانتساب لفرقة الشهيد ریحان؛ حتى بلغت نرين مرحلة المشاركة في المهرجانات مثل: المهرجان الخامس للطفل في مدينة رميلان بمناسبة يوم السلام العالمي سنة ٢٠١٨، وإلى جانب الغناء تجيد نرين العزف على الكمان، والمشاركة في حفلات نوروز الأطفال، وحفلات فنية أخرى، مثل، حفل استذكار الفنان آرام ديكران بأغنية

xemilî zozan، فتقول نرين بفرح: سبق وأن ظهرت على فضائية رونا هي واليوم أنا مسرورة لأجل الظهور على صفحات مجلة مزكين للأطفال.




Nerîn Sebrî

Hevala me Nerîn Sebrî di xwendina xwe de pir jîr e. Herwiha dengê wê jî pir xweş e. Hê di heştaliya xwe de ji malabat û hevalên xwe re stiran dibêje. Nerîn jî wiha dibêje: “Dayîka min piştgiriya min dikir û li ser xwesteka wê ez tevî Koma Şehîd Rîhan ya Hunerê bûm.

Nerînê di gelek mihrîcanan de stiran gotine. Roja Aştiyê ya Cîhanê û Mihrîcana 5. ya Zarokan ya 2018an ya li bajarê Rimêlanê, bi dengê xwe yê xweş ji zarokan re stiran dibêje. Tevî stiranbêjiyê, li kemanê jî dixê. Di şahiyên zarokan yê cejna Newrozê de jî her tim bi stiranên kurdî beşdar dibe.

Nerîn wiha dibêje: “Ez ji hunermend Aram Tîgran pir hes dikim. Ji ber wê ez ji stirana Xemilî Zozan hes dikim.”

Bi kêfxweşi Nerîn dibêje, “Berî niha ez di Ronahî TV de derketibûm û min silav ji hevalên xwe re şandibûn. Niha jî ezê di rûpelên Mizgîn de derkevim.



Mizgîn û
Mafê Zarokan

حقوق الطفل

أمدقائي الأطفال تعرّفوا على حقوقكم عبر حلقاتٍ متتاليةٍ مع صديقتكم مزكين

Hevalên zarok, bi riya xelekên hevala xwe
Mizgîn yên li dû hev mafên xwe nas bikin


٣. مصالحُ الطِّفْلِ الفُضْلَى



عندما يتخذُ البالغونَ قراراتٍ مُعيَّنةً، عليهم أن يفكِّروا، كيف ستؤثِّرُ هذه القراراتُ على الأطفالِ؟ فعلى الأشخاصِ البالغينَ، أن يفعلوا الأفضلَ، فيما يتعلَّقُ بالأطفالِ، كما ينبغي على الحكوماتِ، أن تتأكَّدَ من حصولِ هؤلاءِ الأطفالِ على الحمايةِ والرَّعايةِ من والديهم، أو من أشخاصٍ آخرين عند الحاجةِ، وينبغي على الحكوماتِ أن تتأكَّدَ أنَّ الأشخاصَ المسؤولينَ عن العنايةِ بالأطفالِ، يقومونَ برعايةِ الأطفالِ بصورةٍ جيِّدةٍ، وأنَّ الأماكنَ المخصَّصةَ: لتقديمِ الرَّعايةِ، هي أماكنٌ مناسبةٌ.

Xeleka 3. Mafên zarokan

Dema yên mezin biryaran didin, divê bihizirin ka wê ew biryar bandoreke çawa li zarokan bikin. Divê mezin ji bo zarokan ya herî baş bikin. Herwiha divê rêveberiyên welatan piştraşt bikin ka zarok paraştî ne yan na û dêbavên wan bi qasî pêwîst derbarê wan de baldar in yan na. Eger wisa nebe, rêveberî zarokan digire û li ciyên taybet yên lênêrîna zarokan bi cî dike. Divê rêveberî piştraşt bikin ka berpirsiyarên lênêrîna zarokan li gorî pêwîstiyê karê xwe dikin û ciyên lênêrîne guncaw in ya na.



Keleha Dîwîn

Aras û Nadiya li ser ciyên dîrokî yên başûrê Kurdiştanê diaxivin û bi taybetî behsa Keleha Dîwîn dikin.

Nadiya: Aras, kê ev keleh ava kiriye?

Aras: Keleheke kevnar e, di serdema mîrnişînên kurdî de li ser destê Şadiyê Kurê Merwan ava bûye.

Mizgîn lê zêde kir û got, ew pêşiyên Selaheddînê Eyûbî ne û ji hoza (eşîr)

Rewandî ya Kurdî ne.

Ra`id: Keleh li kû ye?

Aras: Li serê çiyayê gundê Dîwîn yê li bakurê bajarê Hewlêrê yê Başûrê Kurdiştanê ye. Kurdan ji bo parastina xwe bi kar aniye.

Cûliya: Raşt e, keleh li ciyên çiyayî û ji bo parastinê tên avakirin.

Corc: Emê sibe li pirtûkxaneyê dibistanê li wênayên kelehê bigerin

Heval bi nêrîna Hina kêfxweş dibin

قلعة دوين

آراس يحدث ناديا عن المواقع التاريخية في باشور كردستان، ويطلعها على قلعة دوين.

فتسأل ناديا من بنى هذه القلعة؟

آراس: بُنيت في ظلِّ حكم إمارة كردية في عهد شادي بن مروان.

فتضيف مزكين: وهم أجداد القائد صلاح الدين الأيوبي، ومن قبيلة روند الكردية

فيسأل رائد عن موقع القلعة؟

آراس: القلعة تقع على قمة جبل في قرية دوين، شمالي مدينة هولير، استخدمها أجدادنا للدفاع عن أنفسهم.

جوليا: والقلع تُبنى دوماً في مكانٍ يصعب الظفر به؟!

مزكين: نعم يا جوليا.

جورج: ما رأيكم يا أصدقاء أن نبحث غداً عن صور للقلعة في مكتبة المدرسة.

يوافقه الأصدقاء بسرور.





Ceribandina Jîriyê

اختبر ذكائك

بە کۆڵێ جەمەڵێ بەئۆرۆی مەناسەبە

Her hevokê bigihîne wêneyê guncaw

القطة بجانب
المزهرية

Pisîk li tenîştâ
guldaniyê ye

القطة فوق
الكرسي


Pisîk li ser
kursî ye

القطة أمام
الكرسي

Pisîk li pêşiya
kursî ye

القطة خلف
الكرسي





Pisîk li piştâ
kursî ye



Qonaxên wêneyê Berxikê


خطوات رسم

الخروف





Mizgîn
û Wênêkêşî
لقمة مزكین



Dibistana
Mûsa Bin Nesîr
Qamişlo - 20/11/2021



مدرسة:
موسی بن نصیر
قامشلو - ۲۰۲۱/۱۱/۲۰





MIZGÎN

Kovara zarokan ji hêla saziya Ronahî ve tê derxistin

